

Mafên te di miqayîtbûna neçarî

Ji bo kesên bin 18 salî ku hewceyî miqayîtbûna bijîşkiya drûnî ya neçarî ne



Naverok

Te mafê xwe yê wergirtina miqayîtbûna baş heye	3
Miqayîtbûnaa neçarî li gorî LPT'ê	4
Mafê te yê wergirtina zanyariyan heye	6
Kî zanyariyan li ser te werdigire?	7
Te ev maf heye ku kesekî piştewaniyê hebe	8
Dibe ku hinek maf werine sîordarkirin	10
Kiryarên neçarî	12
Te mafê xwe yê nerazîtinîşandanê heye	14
Heke tu nerazî yî yan pirseke te heye	15
Ferheng û kurtkirî	16

Ev belavok li gorî Qanûna Mafê Kopikirinê hatiye parastin.

Di dema vegotinê de divê navê çavkaniyê were anîn. Ji bo veberhemanîna wêne, dimen û vîdyoyan, destûra nivîskar pêwîst e.

Ev belavok bi awayê PDF li ser malpera Desteya Neteweyî ya Tenduristî û Refahê berdest e.

Ev babet dikare li ser daxwazê di formatên din de jî were amadekirin.

Pirsên xwe yên têkildarî formatên berdêl û cihê bo adresa alternativaformat@socialstyrelsen.se se bişîne.

ISBN 978-91-7555-534-8

Hejmara xalê: 2020-7-6854

Çap A4ta.45 Tryckeri AB, çapa yekem dora duyem, Tebaxa 2020

Wêne Johnér Bildbyrå AB, Bildarkivet, Jörgen Wiklund

Ew kesên ku di wêneyê de ne tu têkiliya wan bi naverokê tune



Silav!

**Navê min Rebecca ye. Em hevûdu nas nakin, lê
dixwazim tiştêkî ji te re bibêjim.**

Cîhana min dema ku ez 15 salî bûm, hilweşiya. Ez tûşî damayîn
û tengijînê bûm, min elkoleke zehf vexwar û li malê bû şer û
pevçûn. Ez 15 salî bûm û di dawî de min dixwest ku bimirim.

Rojekê serê sibê polis ez ji bo miqayîtbûna neçarî desteser kirim.
Dibe ku gellek kesan difikirî ku ez bêhêvî me, min fikir dikir ku ez
bêhêvî me. Baweriya min bi mezinan tunebû.

Ez nizamim ku te çi tişt li pey xwe hiştine. Lê hesta vê yekê ku tu li
erdê ketiyî, te hemî tiştên xwe ji dest dane, girîyayî û bihêrs î, qey
nake. Êş derbas dibe, jîyan bi dawî nehatiye. Gelek mezin hene
ku em dikarin baweriya xwe bi wan binin.

Nehêle ku rewşek, nexweşiyek an kes tu teslim bikin. Jîyan digere
û dizivire û tu yê rojekê ewqasî şanazî bi xwe bikî ku te ev qonax
li pey xwe hiştiye.

Zendê xwe hîs bike – lêdana demaran bibîne – jîyan bo te
maye!

Tu girin gî, binirx î, wêrek û bêhempa yî. Hewceyîya min bi te
heye û baweriya min bi te heye!

Ez Rebecca'yê hembêz dikim

Nivîskar û axêver

[illegible]

Te mafê xwe yê wergirtina miqayîtbûna baş heye

Miqayîtbûn divê ji bo te û kesên din ewleh û dilniya be.

Karmend divê fêrîkirî û xwedan ezmûna bijîşkî ya guncan bin. Û ew divê di dema wergirtina miqayîtbûnê da, tiştê ku ji bo te baştir e, li ber çav bigirin.

Dibe ku hertim bi şewaza ku tu dixwazî bi pêş de neçe, lê belê hertim mafê te heye ku bibêjî çi şewazekê dixwazî.

Kengî mirov dikare bikeve jêr miqayîtbûna neçarî?

Bi giştî tu kesek neçar nîne ku berovajî xwesteka te li te miqayîtbibe. Lê heke sê pêwîstiyên Qanûna Miqayîtbûna Neçarî ya Derûnbijîşkî (LPT) di te de werin dîtîn, dikarî vî karî bikî.

Pêdiviyên ku divê bihêne dabînkirin, ev in:

- Tu tûşî aloziyeke derûnî ya ciddî yî.
- Hewceyîya te bi miqayîtbûna derûnî ya şevûrojî heye.
- Te li hember miqayîtbûna ku hewceyî wê yî, li ber xwe daye.

Miqayîtbûnaa neçarî li gorî LPT'ê

Eva ku tu di bin miqayîtbûna neçarî ya li gorî Qanûna LPT'ê de yî, yanî du bijîşkên cihêwaz tê derxistine ku li gorî rêzikên Qanûna Miqayîtbûna neçarî ya Derûnbijîşkiyê, pêwîst e ku tu bi neçarî bikevîn bin derman û terapiyê.

Kî biryar dide ku divê ez bikevim bin miqayîtbûna neçarî?

Ev dikare bi kesekî di atmosfera te de dest pê bibe ku bibîne tu ji hêla derûnî ve hesteke te ya gelekî xirab heye û alikariya te di wergirtina miqayîtbûnê de bike. Carinan polis hewceyî alikariyê ye.

Dema ku bijîşkek tê derxe ku pêwîst e tu bikevîn bin miqayîtbûna neçarî, divê te miayîne bike, pîrsgirêkên te şirove bike, ji ber ku pêwîst e berovajî xwestek û meyla xwe werî dermankirin û belgeyeke razandina neçarî (vårdintyg) binivîsî.

Lê beriya vêya ku bikarî bikevî bin miqayîtbûna neçarî, bijîkekî din divê te miayîne bike û biryar bide ku ku ev heman tiştê e ku pêwîst e.

Bi miqayîtbûna girtî dest pê dibe

Di destpêka miqayîtbûna neçaarî de tu 24 saetên şev û rojê di beşeke girtî de yî. Di hin babetan, piştî demekê dikarî ji bo miqayîtbûna neçarî ya vekirî daxwaz bidî. Ev tê vê wateyê ku heta wê demê ku qanûnên ku bijîşk diyar dike bişopînî, pêwîst nake 24 saetên şevûrojê li nexweşxaneyê bî. Dibe ku neşçar bibî ku li cihêkî taybet bijî, dermanan bi kar binî yan beşdariyê terapiyê bibî.

Te divê bernameyêke miqayîtbûnê hebe

Karmend divê dema herî lez de bernameyek ji bo miqayîtbûnê te amade bikin. Tê de divê were nivîsîn ku çi dermanek ji bo te hewce ye û çawa divê ew terapî ewqasî baş bi pêş de biçe ku êdî hewceyîyek bo miqayîtbûna neçarî nemîne.

Miqayîtbûna neçarî kengî bi dawî dihê?

Bijîşk divê berdewam binirxîne ku gelo tu sê pêwîstiyên miqayîtbûna neçarî dabîn dikî yan na. Heke her yek ji pêwîstiyên nehe sepandin, tu yê êdî nekeve b er miqayîtbûna neçarî.

Heke hema wisa sê pêwîstî werine dabînkirin, bijîşk divê herî pirr di heyama çar hefteyan de daxwazê bide dadgehê (Dadgeha Birêveberiyê) ku dikare heyama miqayîtbûnê dirêj bike. Tu sînooriyek tune ku ev yek çend caran were dirêj kirin.

**Armanca miqayîtbûnaa neçarî
eva ye ku heta radêya pêkan
hesteke te ya baş hebe da ku bikarî
miqayîtbûna hewce ji bo xwe bêyî
neçariyê wergirî.**

Mafê te yê wergirtina zanyariyan heye

Pêwîst e karmend zanyariyan bide te da ku tê bigihêjî û bersiva pirsên te bide.

Mafê te yê wergirtina zanyariyan heye, him li ser miqayîtbûna ku niha werdigirî û him heke ji bo pêşerojê planek jê ra hatiye danîn.

Tu xwedan maf î ku bizanî ku derman, terapî û karên ku di heyama dermankirina te de pêk tî, çawa dikarin bandorê li te bikin.

Zanyarî li ser çareserî û dermanan

Pêwîst e karmendê têkildarî ji te re bibêje ku çawa çareserî û dermanên cihêwaz bandorê li te û leşê te dikin. Her wiha ev mafê te ye bizanî ku gelo terapiyê xetereyek heye, eva ku piştî demekê bikaranîna derman dibe ku çî biqewime û çî dûhatên wê yên pêreyî dibe ku hebin.

Mafê te ye ku bo te bixwînin ku karmend çî dinivêse

Mafê te yê xwendina plana xwe ya miqayîtbûnê heye. Heke pêkan be, karmend divê plana miqayîtbûnê tevî te amade bikin. Herwisa mafê te yê xwendina qeyda bijîşkî ya xwe heye. Lê heke bijîşk wisa bifikire ku bi xwendina beşeke dosyeyê halê te xirabtir dibe yan kalîteya dermanê te tê xwarê, ew zanyarî dikarin ji te bînin veşartin.

**Te ev maf heye ku bipirsî
bê kanê tê digihêjî ku
karmend çî dibêje.**

Kî zanyariyan li ser te werdigire?

Qanûna serekî eva ye ku dayîk û bav zanyariyan li ser tenduristiya te û babetên te yên din wergirin. Lê belê temen û têgihîştina te jî rola xwe heye ku gelo wan mafê wergirtina zanyariyan heye yan na. Heke tu ji ber gihîştina zanyariyên xwe bo dêûbavên xwe hest bi nerihetiyê dikî, dikarî wan nihênî ragirî.

Miqayîtbûn anegorî nihênîbûnê pêk tê

Nihênîbûn bi wê wateyê ye ku rê nadine karmendan ku li cem aliyekî din qala tenduristiya te yan babetên te yên kesane bikin. Halbûkî, heke pêwîst bike ew dibe ku zanyariyên têkildarî te bidine ber destê nexweşxane yan xizmetên civakî da ku bikarî miqayîtbûn, derman an piştevaniya hewce ji bo xwe wergirî.

Heke tu li ber xeterê bî, karmend divê ragihîni

Heke karmend guman bikin an tê bigihêjin ku tu li ber xeterê yî, divê bilez wê yekê ji xizmetên civakî ra bibêjin. Hin mînakên van babetann dikare ev be ku ew guman bikin ku tu ketiyî ber şidetê yan heke bawer bin ku dêûbavê te nikarin bi duristî li te miqayîtbûn bin. Dibe ku ragihandina wan dijwar were xuyakiirn, lê li gorî qanûnê erkdarê kirina vî karî ne.

Dema ku raporeke bi vî rengî ji aliyê xizmetguzariya civakî va digihêje, divê ewna lêkolîn bikin ku gelo pêwîstiya te bi piştevanî yan alikariyê heye yan na. Te ev maf heye ku zanyariyan wergirî û nêrîna xwe bînin ziman.

Te ev maf heye ku kesekî piştevaniyê hebe

Kesê piştevan kesekî mezin e ku ji derve tê û dema ku di miqayîtbûna neçarî de yî û ji bo meheke piştî wê piştî te digire.

Kesê piştevan di babetên te yên kesane de alîkariya te dike, di xavê û demê diogel te derbas dike.

Kesekî piştevan piştî te digire, ne ku karmend an dêûbavên te.

Qanûnên têkildarî kesên piştevan

Dibe ku kesê piştevanê te bi awayekî rêkmend were hevdîtina te, lê carinan dem û pêvajoyên rêveberiyê dikarin serdanan kontrol bikin. Ji bilî serdanan, ew kes dikare wek mînak beşdarî civînên te bibe yên têkildarî miqayîtbûna te û di dema danûstanan de li dadgeha kargêriyê de piştî te bigire.

Kesê piştevan erka nihênîbûnê derbarê tenduristî û zanyariyên te yên kesane heye. Wateya wê yekê ev e ku ew tenê di babetên taybet û îstîsna de dibe ku kesên din haydar bike.

Bi vî rengî kesekî piştevan werdigirî

Karmend divê derdem ku te hest kir ku têra xwe halê te baş e, van zanyariyan wergirî, ji te bipirsin ku gelo kesê piştevan dixwazî yan na.

Ev desteya rawêjkariya nexweşan e ku kesek piştevan ji bo te diyar dike.

Heke te ji pêş va bi rêya xizmetguzariyên civakî kesekî pêwendîdar heye, ew kesa dikare kesê piştevanê te be. Heke dixwazî kesê piştevan biguherînî yan heke giliyekî te heye, dikarî digel karmendên miqayîtbûnên civakî yê Komîteya Nexweşan biaxivî.



Dibe ku hinek maf werine sînardarkirin

Dema ku di miqayîtbûna derûnbijîşkiya neçarî de di bin terapiyê de yî, dibe ku hinek maf bihêne sînardarkirin.

Telefon û komputer û name

Di pirraniya babetan de, te ev maf heye ku digel dêûbav, serperest, xizm û kes û hevalên xwe di têkiliyê de bî. Loma tu dikarî di dema miqayîtbûna xwe de digel her kes ku dixwazî pêwendî çê biki. Karmendan destûra xwe tune ye ku guhdariya telefonên te bikin yan tiştê ku tu dinivîsî bixwînin.



Di babetê îstîsna de, dibe ku tu ji têkiliya telefonî yan bikaranîna komputerê bihêyî qedexekirin. Dibe ku ev yek ji ber wê yekê be ku pêwendiyên te bibin sedem ku halê te xirabtir bibe yan bibe hokara wê yekê ku miqayîtbûna te diwartir bibe. Derdem ku hegera qedexetiya bikaranîna komputer an telefonê ji holê rabibe, te mafê xwe yê bikaranîna wê ya dubare heye.



Te hertim ev maf heye ku nameyekê ji parêzer, rwêjkarê giştî yan jêderka gelemperî re bişînin û nameyan wergirî bêyî ku karmend wê bixwînin. Halbûkî dibe ku ji bo karmendan pêwîst be ku hinek ji nameyên ku ji te re tên bixwînin da ku piştrast bibin ku li nava wan elkol, madeyên hişber an tiştên ku zirarê li te didin an rêkmendiya nexweşxaneyê aloz dikin, tune ye. Heke karmend tiştine wisa bibînin, mafê wan heye ku wan ragirin.

Karmend dikarin kelûpelên te seh bikin

Heke bijîşk vê yekê pêwîst bizane, karmend dibe ku seh bikin ku te hinek alav û amûr hene ku destûra te ya hilgirtina wan tune. Dibe ku elkol, madeyên hişber yan her tiştekî din be ku zirarê li te yan kesekî din bide.

Di heyama vekolandin û sehkirinê de, karmend dikarin kinc û çenteya te seh bikin. Herwiha dibe ku ji te bixwazin ku cil û bergên xwe ji xwe bikî ji bo ku leşê te yê rût û tazî bibînin. Karmendan destûra xwe tune ku destê xwe li leşê te bidin.



Serdan

Te ev maf heye ku di heyama dewreya miqayîtbûnê de digel kesên ku i te re giring hevdiin pêk bînin. Dêûbav, xwişk û bira û hevalên te dikarin di saetên serdanê de bihêne beşê.

Di babetên îstîssna de, dibe ku serdanên te bihêne sîordarkirin. Ev yek dibe ku ji ber vê yekê be ku serdan bibine sebeb ku halê te xirabtir bibe.

Çalakî û mijûlatiyên li derve

Te ev maf heye li cihê ku terapiyê werdigirî çalakîyên te yên rojane hebbin û her roj ji kêmî saetekê li derveyî avahiyê bî.

Di babetên îstîssna de, ev maf dibe ku werine sîordarkirin. Ev yek dibe ku ji ber vê yekê be ku ev çalakî dikarin halê te xirabtir bikin.

Halbûkî, heke tu di bin miqayîtbûna neçarî de yî, te destûr tune ku bi tenê beşê yan nexweşxaneyê biterikîn. Ji bo kirina vî karî divê îzna te ya bijîşk hebe. Ev jî wek mirexesbûn an rehetbûn tê binavkirin.

Te hertim ev maf heye ku di mijarên ku têkildarî te ne de nêrîna xwe derbibirî, mezintir divê vê yekê li ber çav bigirin.

-- Ji Kenvensyona Mafên Zarok

Kiryarên neçarî

Tenê wek rêçaareya herî dawî

Di miqayîtbûna neçarî de karmendên tenduristiyê dibe ku di babetên taybet û îstîsna de karinan bikin ku rasterast berovajî meyl û xwesteka te be. Kiryarên neçarî tenê demekê dibe ku bihêne bikaranîn ku rêyeke din ji bo berovajîkirina rewşa awarte ku ji bo te yan kesên din metirsîdar e, tunebe.

Heke tu ketiyî bin kiryareke neçarî, divê di dosyeya bijîşkî ya te de bihê destnîşankirin.

Dermanpêdana bi neçarî

Heke naxwaazî dermanan bi kar bînî, karmend dibê heta radeya pêkan rêzê li wê yekê bigirin. Bi vî halî, heke bijîşk tê derxe ku hîn ji divê dermanekî taybet bixwî, bikaranîna derman bi zorê rêpêdayî ye.

Kes nikare gefa wê yekê li te bixwe ku bi kemberê werî girêdan yan ku werî cihêkin.

Girêdana bi kemberê

Bijîşk dibe ku biryar bide ku tu divê bi kemberê bihêyî girêdan, lê tenê di rewşekê de ku xetera bilind a zirardîtîne hebe û bi tu şêwazeke din pêkan nebe.

Tu wextî nabe ku zêdetir ji heyama ku pêwîst e, bihêyî girêdan.

Dibe ku herî pirr saetekê kember were girêdan. Heke biryar be heyameke dirêjtir bi kembeerê bihêyî girêdan, bijîşk divê biryareke nû bide ku herî pirr saetek derbasdar e.

Tu sînardariyek li ser hejmara biryarên ku bijîşk dikare bide, tune. Lê derdem ku êdî tu hegerek ji bo vêya ku kember bihê girêdan, tunebe, tu yê bihêyî berdan.

Karmendên miqayîtbûna tenduristiyê divê di hemî demê de li nav odeyê digel te bin.

Cihêkirin – li odeyê bimîne

Bijîşk dikare biryar bide ku te cihê ragire; wek mînak derî kilîl bike yan pêşiya te bigire ku nekarî ji odeyê derkevî. Lê belê tenê heke bi tu şêwazeke din nekare ew kara were kirin.

Ji bo ku tu bihêyî cihêkirin, tenê ev yek bes nîne ku tu têkder û acizker bî. Divê tevgeriyana te ya hêrişkerane hebe ku bi awayekî cidî miqayîtbûna kesên din têk bide.

Dibe ku herî pirr bo heyama du saetan werî cihêkirin. Heke biryar e ku heyameke zêdetir di tenê û tecrîdê e bî, bijîşk divê biryareke cidî bide ku herî pirr du saetan derbasdar e.

Tu sînardariyek ji bo hejmara biryarên ku bijîşk dikare bide tune, lê qey ku tevgeriyana te êdî miqayîtbûna ji kesên din dijwar bike, divê bihêyî berdan.

Karmendên çavdêriyê divê di navbirên rêkûpêk de rewşa te seh bikin.

Te mafê xwe yê nerazîtînîşandanê heye

Heke tu wisa bawer î ku biryarên ku li ser dermankirina te dihêne dayîn şaş in, dikarî li dadgehek bi navê "Dadgeha Birêveberî" (förvaltningsrätten) gilî bikî; ev kar wek "Nerazîtînîşandan" tê binavkirin. Lê belê hemî biryar nakevin ber venihêrînê.

Karmend divê ji te re bibêjin ku çawa vîê karî bi cih bînî

Karmend divê bi te re bibêjin ku dikarî li dijî kîjan biryaran nerazîtî nîşan bidî. Herwisa pêwîst e ku ji te re bibêjin ku çawa pêk bînî û çawa nerazîtîyê bo Dadgeha Kargêriyê anku Dadgeha Birêveberiyê binivîsî.

Rawêjkarekî gelemperî dikare yarmetiyê bide te

Heke li dijî biryarekê li Dadgeha Kargêriyê nerazîtî nîşan bidî, ew divê alîkariya te bikin ku digel rawêjkarekî gelemperî pêwendî çê bikî. Ev kesekî mezin e ku alîkariya te dike ku nerazîtî nîşan bidî û digel dadgehê di têkiliyê de bî. Wergirtina yarmetiyê ji bergirîkera giştî belaş e.

**Mafên zarokan hemî zarokan digire bin
sîvana xwe. Wek mînak, rengê çerm,
zayend, ziman, regeza neteweyî yan dînê
te qet giring nîne.**

-- Ji Kenvensyona Mafên Zarok

Heke tu nerazî yî yan pirseke te heye

Hertim dikarî digel karmendên miqayîtbûnê yan bijîşkê xwe biaxivî. Ew alîkariya te dikin û berpirsyar in di vê yekê de ku miqayîttbûneke baş werdigerî.

Bi meyl û meraqeke tevav serdana min bike!



Hêla Yarmefîiya Zarok û Nûciwanan

Heke dixwazî li sser mafên xwe bipirsî yan bibêjî ku tiştek di terapiya te dde bi başî pêş de naçe, dikarî digel "Hêla Zarok û Nûciwanan" pêwendî çê bikî.

Pêwendî bi belaşî ye û li ser fatûreya telefona te dernakeve.

Telefonî hejmara 020 120 06 06 bike.

Hêla telefoinê di rojên hefteyê de ji saet 9ê berî nîvro (bn) heta 5ê piştî nîvro (pn) vekirî ye.

Dema ku telefon girêdayî ye, dikarî peyamekê li ser amûra bersivdêr bihêlî. Pêwîst nake ku ji me re bibêjî ku tu kî yî.

Ferheng û kurtkirî

Serokê Bijîşkî

Bijîşkek ku pîsporê bijîşkiya derûnî ye û berpirsyarê beşa miqayîtbûna neçarî ye

Dadgeha Kargêriyê

Dadgehek ku bikaare biryar li ser miqayîtbûna neçarî bide.

Biryara wergirtinê

Hin biryar li sser miqayîtbûna neçarî ku divê hebe Beriya ku te destûra xwe ya miqayîtbûna neçarî hebe. Ew bijîşka ku Biryara wergirtinê dinivîse divê pîsporê bijîşkiya derûnî be

Kesê pêwendîdar

Kesek li nav karmendan ku erka berpirsariya taybet bo têkilîdanîna bi te re heye

LPT

Qanûna miqayîtbûna bijîşkiya derûnî ya neçarî

LRV

Qanûna miqayîtbûna bijîşkiya neçarî ya qanûnî.

Mirexesi û rehetbûn

Derfeta wê yekê ku tu bixwe bi awayê serbixwe li derveyî nexweşxaneyê, wek mînak li malê da bî

Miqayîtbûna neçarî ya razandinê

Miqayîtbûna neçarî li nexweşxaneyê bi awayê şev û rojî.

Bawernameya miqayîtbûnê

Bawernameyeke bijîşkî ya seretayî ye ku pêwîst e ji bo ku bikarî miqayîtbûna neçarî wergirî. Heke bawernameya bijîşkî hebe, dibe ku beriya biryardana li sser razandina te ya bi neçarî li nexweşxaneyê, berovajî xwesteka xwe li nexweşxaneyê bihêyî razandin.

Plana çavdêriyê

Belgenamê ku derman û babetên din ên hewce ji bo te di heyama miqayîtbûnê de şirove dike.

Miqayîtbûna neçarî ya derûnbijîşkiya azad


Dibe ku pêwîst be ku hin dermanên taybet bi kar bîni yan di terapiyê de beşdar bibî, lê hewce nake . ku bi awayekî 24/7 li nexweşxaneyê bî

Mafên giştî yê zarokan li "Konvensyona mafên zarok" hatiye; yanî heman konvensyona NY'yê derbarê mafên zarokan. Konvensyona mafên zarok li Swêdê qanûn e.

Rêzikên ku ji bo hemîyan dihne sepandin, di Qanûna Tenduristî û Xizmetên Bijişkî (HSL) de, Qanûna Nexweşan û Qanûna Ewlehiya Nexweş (PSL) tên dîtin.

Hinek qanûnên taybet ji bo Miqayîbûna bijîşkiya derûnî berovajî meyl û xwesteka nexweşan di Qanûna Miqayîbûna Bijîşkiya Derûnî ya Neçarî (LPT) hatine bicihkirin.

Qanûnên têkildarî nihênîbûnê di Qanûna Destragihîştina Giştî bo zanyarî û Nihênîbûnê (OSL) hatine tayînkirin.



Ev babetên zanyariyan anegorî qanûn û rêzikên din ên têkildarî miqayîbûnên neçarî yê bijîşkiya derûnî hatine darêştin.

Jib o zanyarî ji bo zarok û nûciwanan rehetir bihêne fêmkirin, hinek ji têgih û bêjeyên mafevanîyê disanê hatine hêsanîkirin û venivêrandin.

**Te hertim mafên xwe hene, heta dema ku di bin miqayîtbûna neçarî de yî.
Di vê belavokê de em der barê mafên ku te hene û herwiha derbarê
babetên taybet ku dibe ku zor û neçarî were bikaranîn, şirove dikin.**

**Mafên te di miqayîtbûna neçarî de – terapî li gorî Qanûna LPT'yê (Hejmara
xalê 2020-7-6854) dikare ji beşa weşanê ya Rêxistina Xizmetên Civakî
(Socialstyrelsen) were siparîşkirin.**

www.socialstyrelsen.se/publikationer

E-Mail: publikationsservice@socialstyrelsen.se

Faks: 035-19 75 29

Ev belavok herwîja dikare ji adresa www.socialstyrelsen.se were daxistin.